



## Erkâna Qurbanê

Delalên ezîz li rûyên we yên gul cemale re eşq be

Em weke lijneya bawerî ya Federasyona Yekîtiya Elewî yên Almanyayê temenî dikin ku erkâna qurbanê, li gorî usûlên erkân û riyê û di çarçoveya şert û mercên qanûnî de û li malên Ceman bê kirin.

Bi rizaya endamên malên Ceman, loqmayên zêde weke her carî bidin malên Ceman yên xwe û yan jî wan loqma yên zêde bigihênin kesên hewcedar û ev yek wê bibe nîşaneya qenciya bawerîya me.

Cana min qurban, çermê min terciiman e,  
 Ez bi qurbana Welî yan  
 Îqrara min ji ezelê  
 Canê min li meydanê ye meydanê  
 (Nesîmî)

Di Elewîtîyê de, qurbana esas terbîyekirina nefis e. Bi gotina ‘Cana min qurban, çermê min terciiman e’ li dara Mensûrê îqrar dayîne û li ser îqrra xwe sekinandin e.

Di riya Welîyan de dest dayîn û bi riya îlim û zanebûnê kemilîne û di El-Heq’ê de çêbûn e. Bi saya hezkirin, başbûn, xweşikbûn, rastbûn, qenciye û mirovê kâmil ango însanê kamil, ev riya herî rind e ku meriv nêzikê Xwêde dike di Elewîtîyê de.

Bi giştî dest ji her tiştê xwe berdan ango dest ji vê dinyayê berdan û gihastina qonaxa mirovê kâmil û berî ku bimirî, bimirî.

Li gel hezkirin û xweşikbûnê gihastina qonaxa mirovê kâmil û bi Heqê re yekbûyîn e. Dayîna canê xwe ji bo Heqê û dilsoziya riya xwe û bi riya terbîyekirina nefsa xwe berî ku bimirî, bimirî.

Şax Xatayî dike û dizane her can  
 Erkân ber bi qurbanê ve meşîya  
 Di neynûka wî de tesbîh û di xwîna wî de mercan

Ev qurban muslîmên mumînan re hat

Weke ku Pîrî me Xateyî jî anîye ziman ber bi qurbanê ve erkân dimeşe çimkî cana ku îqrra kiribe canê xwe dike qurban.

Ji Heqê ra nîyazê me ew e ku; me li rastê kesên bêyom, bènûr, durû û bêPîr neyîne. Qismetên me zêde û li mal û ocaxên me kêyf hebe, em bigihêjin mirazên xwe û erkâna me bê qebûl-kirin.

Xwediyên loqmayan ji loqmayên xwe şefaet bibînin, Heqê Teala nîyazên me qebûl bike.

Ji bo dinyayeke bi aşî û dilovan eşq bibe  
 05.07.2022  
 Lijneya Bawerî ya FYEAYê